



Scotland's Census

Shaping our future

A' dealbhadh ar n-àm ri teachd

# Rêbernameyek ji bo Serjimêra 2022 yê ya Skotlandê



**Serjimêra Skotlandê.**

Derxistina tiştên rast, dest pê dike **bi dagirtinê.**

Biçe li ser [census.gov.scot](https://census.gov.scot)



## Serjimêr çi ye?

Serjimêra Skotlandê serîhejmartina fermi ya hemû kesan û hemû malbatan e di vî welatî de. Ew bi gelemperî her 10 salan carek tê lidarxistin. Serjimêr pirsan dipirse derbarê temen, zayend, mal û rewşa jiyane, kar, asta perwerdehî û şiyane mirov di gel nijada mirovan.

Temamkirina serjimêrê girîng e ji ber ku bersivên we ji bo Scottish Government û çendîn dezgehên xizmetgûzariyê daneyan dabîn dikin ku pêwîst in di pêvajoya girtina biryare girîng de yê ku bi jiyana mirovan û gelan re têkildar in.

Di nav wan biryaran de ew hene: pare dê çawa were terxankirin ji bo xizmetên girîng di nav civakên me de, ji bo perwerdehî, xanî, tendirûstî, rê û rêhesinan û çendîn xalên din.

## Roja Serjimêrê kengî ye?

Roja Serjimêrê 20ê Adarê ye, lê tu yê karibî serjimêra xwe temam bikî gava ku nameya te bigihîje ber destê te. Lê belê, bersivên te divê derbarê hemû endamên malbata te de bin di roja Yekşemê, 20ê Adarê.

## Ez ê çawa serjimêrê dagirim?

Tu dikarî serjimêrê bi rêya internetê yan jî bi daxwazkirina kopîyeke kaxizî temam bikî. Ji dawiya Sibata 2022yê pê ve, nameyin bigihîjin li ber destê endamên malbatê ku tê de rênmayîyên temamkirina serjimêra 'online' heye.

'Website'a temamkirina serjimêrê dê ji 28ê Sibata pê ve vekirî bimîne.

1. Biçe li ser [www.census.gov.scot](http://www.census.gov.scot)
2. STARTê bitikîne
3. Koda Xwelêgihandinê ya Internetê ji nameya ghiştiye ber destê te binivîse
4. Rênmayîyên li ser ekranê bişopîne

Eger te divêt tu daxwaza kopîyeke kaxizî bikî, yan jî eger pêwîstiya te bi Kodeke nû ya Xwelêgihandina Înternetê hebe, biçe li ser [census.gov.scot](http://census.gov.scot) yan jî telefonî xeta alîkariyê bike bi **0800 030 8308**.

## Gelo ez mecbûr im wê temam bikim?

Erê. Berpirsariyê qanûnî ye ku hemû endamên malbatên Skotlandê rapirsîyek serjimêrê temam bikin. Misogerkirina vê tiştê pir girîng e ku divê serjimêr di derbarê neteweyê gişt zanyariya berfireh û rast dabîn bike.

Ew kesê ku di filan xaniyê de yan dijî, yan xwedîyê wê ye û kirê dike yan jî fatûreyên wê dide erdkar e ku serjimêrê tamam bike. Eger tu di navendeke xwedîkirinê, cihê mayîna xwendekaran yan jî hostelekê de yî, û temenê te ji 16yê jortir e, divê tu serjimêreke takekesî tamam bikî di gel cihgirtina di rapirsîya bicîbûna civatî.

## Wê çi bibe eger ez pirsan fêm nekim?

Gava ku website'a tamamkirinê ([census.gov.scot](https://census.gov.scot)) ji 28ê Sibatê ve despê bike, tu yê karibî biçî nav de û rênmayîyên zêdetir bibînî ji bo ku çawa mirov dikare bersîva her pirsê bide bi hemû zimanên li jêr. Herwiha, alîkarî bi çendîn zimanên din mimkûn e di xeta me ya alîkarîyê de bi **0800 030 8308**.

Erebî	Gayelîkî	Mandarînî	Ûrisî
Kantonî	Hindî	Lehkî	Slovakî
Çekî	Kurdî	Pencabî	Tirkî
Farsî	Lîtvanyayî	Romanyayî	Ûrdûyî

## Eger ez astengdar bim?

Em hevkarîyê di gel beşek komên astengdariyê re dikin ji bo ku xwelêgihandina serjimêrê hindî ji destê me tê bila hêsantir be. Eger pêwîstiya te bi alîkarîyê hebe yan te kopîyek rapirsîyê di formateke cûda de divêt, ji kerema xwe re bi navenda têkilîyê re bikevin têkilîyê, yan jî biçe li ser [census.gov.scot](https://census.gov.scot). Herwisa, ji bo tamamkirina serjimêrê, tu dikarî alîkarîyê ji xwedîkerek, hevalek yan jî xizmekî xwe bixwazî.

Eger te pirsgirêken bihîstin û axaftinê hene, ji kereme xwe xizmeta 'text relay'ê bikarbîne bi **18001 0800 030 8308**.

## Gelo zanyarîyên min yên serjimêrê parastî ne?

Belê. Berî ku em daneyên serjimêrê belav bikin, em hemû agahiyên şexsî jê radikin ji bo ku bi rêya bersivên wan neyê zanîn ka ew kî ne. Daneyên serjimêrê bi sedsalekê nayên parvekirin û hikûmet jî xwedî vê bîrûbawerîyê ye ku hejmara kesên ku dikarin xwe bigehînin wan daneyan di rêjeya mînimûmê de bigire.

## Ger hêj pêwîstiya min bi alîkarîyê hebe?

Navenda me ya têkilîdanîyê dê vekirî be ji 28ê Sibatê pê ve û telefonkirina ji xetên sabît yan ji yên mobayl bê pere ye bi **0800 030 8308**. Di heman demê de, tu dikarî têkilî danî bi rêya 'webchat'ê li ser [census.gov.scot](https://census.gov.scot).

# Serjimêra Skotlandê.

Derxistina tiştên rast, dest pê dike **bi dagirtinê.**

Biçe li ser [census.gov.scot](https://census.gov.scot)

